

**Dema hûn hatin Elmanyayê, di pêvajoya rê de an jî di nava Elmanyayê de, hûn qet rastî tawanbariyê hatin? Em komeke lêkolînerin û dixwazin bi we re li ser serpêhîtiyên we bipeyvin!**

**Em kî ne û em çî dikin?**

Em lêkolînerên zanîngeha Ruhr a Bochumê ne. Em li ser tawanbariyê û li ser mirovên ku bûne mexdûrê tawanbariyê lêkolînê dikin. Em dixwazin bizanibin bê ka penaber bi kîjan sûcan re rû bi rû mane. Herwiha em dixwazin bizanibin bê ka rewşa wan a li Elmanyayê çawa ye. Loma, em dixwazin kesên koçî Elmanyayê kirine, yê revîne û hatine Elmanyayê, ezmûnên xwe bi me re parve bikin.

**Hûn ê bikaribin ji me bawer bikin?**

Erê. Em dixwazin serpêhatiyên we gûhdarî bikin. Hûn bi xwe biryar didin ka hûn dixwazin bi me re çî parve bikin. Rastî an jî çewtî tune ye. Em naxwazin hestên xirab bikin dile we. Em ê agahiyên şexsî yê derbarê we de, bi kesên din re parve nekin û ji xwe em ji aliyê zagonî ve jî, ji vê yekê berpirsiyar in.

**Wê çî bi çîroka we bê?**

Em agahiyên gelek mirovên weke/î we kom dikin. Em dixwazin çîroka we û ya kesên din wek raporekê berhev bikin. Di raporê de wê navê we qet neyê nivîsandin. Çîroka we ji bo rewşa mirovên koçberî Elmanyayê bûne an jî reviyane û hatine Elmanyayê, mînakek e. Em ê vê raporê biweşînin û bidin sîyasetmedar, sazî û dezgehên alîkar ên Elman daku ji rewşa mirovên weke/î we yê li Elmanyayê agahdar bibin.

**Hevpeyvîna me wê çawa derbas be?**

Hûn biryar bidin ka li kuderê û bi çî zimanî (bi zimanê dayikê, bi elmanî an jî bi îngîlîzî) hûn vê hevpeyvînê dixwazin. Ger hûn bixwazin bi zimanê dayikê vê hevpeyvînê çêkin, wê wergêrek vê hevpeyvînê ji bo we wergerîne. Di hevpeyvînê de, lêkolîner wê ji we bipirse, bê ka di kîjan mijaran de hûn bûne mexdûr. Herwiha wê ji we bipirse ka çî bi serê we qewimiye û rewşa we ya îro çawa ye? Hûn ê bi tenê tiştên ku dixwazin vebêjin. Dema ku hûn çîroka xwe vebêjin, em ê dengê we qeydî bandê bikin. Em vê yekê, ji bo ku çîroka we ji bîrnekin dikin. Piştê em ê tiştên ku we gotine binivîsînin. Piştî nivîsandinê em ê di cih de dengê we jêbibin. Em ê navê we qet qeyd nekin. Hûn ê anonîm bin. Agahiyên derbarê we de, wê bi tu kesî re neyên parvekirin.

**Piştî hevpeyvînê**

Ger hûn piştî hevpeyvînê xwe baş hîsnekin, em dikarin ji bo we hevdîtinekê ji psîkiyatrist daxwaz bikin an jî li gorî daxwaziya we em dikarin navnîşana psîkoterapist bidin we û hûn serî lê bidin. Em ê ne ji hevdîna we, ne jî ji tiştên ku hûn ji psîkoterapist re dibêjin agahdar bin. Ger hûn piştî hevpeyvînê bixwazin careke din li tiştên ku we ji me re gotine gûhdarî bikin, hûn dikarin xwe bigihînin me. Em dikarin qeyda dengê we pêşkeşî we bikin û hûn dikarin careke din li gotinên xwe gûhdarî bikin.

**Em dixwazin wek koma lêkolîner xwe bidin nasîn:**



Ingke Goeckenjan  
E-Mail: [ingke.goeckenjan@rub.de](mailto:ingke.goeckenjan@rub.de)



Christian Roy-Pogodzik  
E-Mail: [christian.roy-pogodzik@rub.de](mailto:christian.roy-pogodzik@rub.de)



Farina Kronsbein  
E-Mail: [farina.kronsbein@rub.de](mailto:farina.kronsbein@rub.de)



Bettina Voußen  
E-Mail: [bettina.voußen@rub.de](mailto:bettina.voußen@rub.de)

**Hûn dikarin bi rêya hejmarên telefonê yên li jêr xwe bigihînin me:**

Hejmara ofîse: +49 (234) 32-25345

WhatsApp: +49 177 853 1467

Bochumer Fenster, 7. Etage (Qatê 7.)

Massenbergstraße 11

44787 Bochum